Cûdahiya Îngilîstan û Almanya yê

E-Kurd

Ahmet DERE

"Di vî warê de rola cîwanan xwedî girîngiyekî mezin e. Ez vê tiştê tenê ji bo ku cîwan xwedî hêzekî dînamîk in bilêv nakim. Dema ku em li diyaspora Kurdên li Ewropayê dinêrin, beşa wî ya herî bi derfet cîwan in. Bi taybetî di warê fêmkirina mentalîteya Ewropî û qanûnên wan de ev beş pir dewlemend e. Di warê jîrbûna fîzîkî de jî ev beş xwedî hêzê ye, di warê zanabûnê de jî. Lewre em dikarin pir kar û xebatê ji cîwanan bixwazin."

Yekitiya Ewropayê ji 25 welatan pêk tê. Di nava van welatan de Fransa, Îngilîstan û Almanya xwedî hêza sereke ne. Qasê ku Fransa di warê siyasî de xwedî soza herî bi tesîre, Almanya jî di warê aborî de xwedî sozekî bi bandor e. Tê zanîn ku Îngilîstan jî di warê siyasî û aborî de ji Fransa û Almanyayê kêmtir nî ne. Bi taybetî ji ber têkiliyên Îngilîstanê ku bi Amerîkayê re heye, ew di nava Yekîtiya Ewropayê (YE) de xwedî cîhekî cûda ye.

Ji salên 1990 vir ve, bi pêşketinên xebatên kurdan li Ewropayê, helwestekî siyasî a YE'yê li hember pirsgrêka kurdan pêş ket. YE'yê pirsgrêka kurd girt nava rojeva xwe a veşartî. Çi saziya YE'yê, çi jî dewletên endamên YE'yê, ji salên 1990 şûn ve maseyên xebatê yên taybetî di derbarê kurdan de tanzîm kirin. Ev mase zêdetir ji alî derdorên ewlekariyê ve hatine çê kirin lê, bi awayekî giştî ew ji hêla saziyên siyasî ve hatin kontrol kirin. Roja îroyîn di pir welatan de ev maseyên

mijara gotinê hene û bi çalek in.

YE'yê ti car, weke Sazî, xwe nake xwedî helwestekî neyênî û pir tûnd li dijî gelê kurd. Ev, ji ber hejmarên vî yekîtiyê ku li ser kurdan heye ye. Dema ku hatiye xwestin li hember kurdan helwest were nîşandan, dewletên weke Îngilîstan an jî Almanya derketine pêş. Carna jî Fransa înîsiyatîf girtiye lê belê, heya ku ev welat zêde nehatibe teng kirin, wî helwestekî neyênî li dijî kurdan nestandiye. Zêdetir Almanya û Îngilîstan tim li pêş bûne.

Dema ku em li roja îroyîn dinêrin, ji bo van her du welatan jî heman rastî derdikeve pêş. Tê zanîn di rojên derbasbûyî de Îngilîstanê, bi biryarekî, saziyên gelê kurd weke PKK û KONGRA-GEL qedexe kir. Lê belê, tê zanîn ku ev saziyên kurdan ji mêj ve bi biryara YE'yê hatine qedexekirin. Îngilîstan jî endamê vî yekîtiyê ye. Lewre, di warê hiqûqî de tu wateyekî pir cûda a vî biryara Îngilîstanê tine ye. Digel vî rastiyê ev biryar hatiye girtin. Sedemên wî, weke min li jor aniye ziman, bi siyaseta YE'yê a giştî ve girêdayî ye. Di vî demê de pêwîstiya dewleta tirk bi moral û her waha bi alîkariyekî navneteweyî heye. Lewre, weke her demên derbasbûyî, dewleta Îngilîstanê û ya Almanyayê, dîsa bi navê YE'yê li cem dewleta tirk ciyê xwe girtin.